# Qeydkirina telefonê

Daîreya Koçberan lêpirsîna mafê penaberîtiyê herdem qeyd dike – dikarî bo xwe daxwaza wê qeydê bikî

Qeyd pênc salan tê parastin.

Dikarî daxwaza qeyda lêpirsîna xwe ya mafê penaberîtiyê belaş bikî. Qeyd dê li ser sêlikeke CD were şandin. Ji ber sebebên ewlehiyê, qeyd wek pêvek li gel emailê nayê şandin.

Bi forma daxwazkirinê bo xwe dawa qeydê bike.

Dikarî werî Daîreya Koçberan bo guhdarîkirina qeydê eger bixwazî.

## Tu jî dikarî lêpirsîna xwe qeyd bikî

Lêpirsîna mafê penaberîtiyê li cihekî tê kirin ku cemawer nikare bi azadî werinê. li wî cihî qeydkirina lêpirsînê anku wênegirtin, deng qeydkirin yan vîdyogirtin mimkin e bo çavdêriya karûbarên Daîreya Koçberan.

Girtina wêneyekî yan vîdyoyekê ji karmend an tercumanên Daîreya Koçberan qedexe ye ji ber ku ew ne çavdêrîkirina bûyerên lêpirsînê yan karkirina tercumanan e.

## Qeydkirina tenê di dema lêpirsînê de li cihê bo wê diyarkirî serbest e

Dikarî lêpirsîna xwe tenê di dema lêpirsînê de li cihê bo wê diyarkirî qeyd bikî. Nabe ku berî lêpirsînê, dema bêhnvedanê yan li derveyî lêpirsînê bo nimûne li salona bendewariyê ya li kesên derveyî girtî bigirî. Qeydkirina li wan cihan bi hemû şiklên cuda qedexe ye daku nasname û kesayetiya penaxwazên din parastî be.

Ji ber hesasiyeta karûbarên penaxwaziyê, wezîfeya karmendan e ku nasname û kesayetiya penaxwazan biparêzin û loma qedexeya qeydkirinê li cihên ji cemawerî re girtî ku penaxwaz lê hene muhim e.

Bi awayekî giştî qeydkirina lêpirsînan li cihên yekîneya girtî serbest e. Di hin haletên taybet de ji ber sebebên di qanûnan de diyarkirî mumkin e ku qeydkirin li yekîneya girtî were qedexekirin.

Eger lêpirsîna xwe qeyd bikî, ji bîr neke:

- Nabe ku qeydkirina nerehetiyê bide lêpirsînê. Eger lêpirsîn nerehetiyê bide lêpirserî yan tercumanî, lêpirsîn dikare were rawestandin.

- Hilkirina hêza telefona destan di lêpirsînê de bo qeydkirinê û tehlîkeyên veguhastina agahiyan li ser berpirsiyariya te bi xwe ne. Daîreya Koçberan pêşniyaz dike ku tu hêza telefona xwe qut bikî eger lêpirsîna xwe qeyd nekî.
- Nabe ku mirov cihazên zêdetir, wek çirayan yan mirovên zêdetir bo qeydkirinê bîne lêpirsînê.